

## Daxwiyaniya razîmendiyê ji bo bikaranîna wêne û filman

Ez bi îmzeya xwe qebûl dikim, ku karmendên saziya "Lesen", wan wêne û filmên ku ji min re yan ji wê/wî kesa/kesê qasir re/wê/wî kesa/kesê ku ez serwera wê/wî ya qanûnî û nûnerê wê/wî me, **li roja**

Dem

**li civîna rojnamevanî li workshopa/semînarê bi navê**

**li**

**Dezgeh, navnîşan**

hatîn kişandin di wan alavên medyayî de, ku li xwarê hatine binavkirin, di çarçoveya amadekirina raportan li ser komeleyên xwendinê yan li ser media.labs, di çarçoveya bernameya piştgîriyê ya Wezareta Federal ji bo Xwendin û Lêkolînê (BMBF) ya bi navê "Kultur mirov bi hêz dike" û her wiha ji bo karê çapameniyê yê hemî hevpişkên peywendîdar (Wezareta Federal ji bo Xwendin û Lêkolînê (BMBF), DLR wek serperîştê projeyê) li ser vê projeyê biweşînin û belav bikin.

**Pêzanînen şexsî:**

**Navê malbatî, pêşnavê zarok**

- Ez qebûl dikim, ku ew wêne û filmên li ahenga li jor hatî binavkirin, hatine kişandin, ji aliyê saziya "Lesen" ve û ji aliyê hevpişkên wê yê projeyê ve, ku navê wan li jor hatine diyarkirin, di medyayên çapî de (wek nimûne, belavok, agahname, plakât, raporta karî), li internêtê (wek nimûne, malper, platformên medyayên civakî) û li intranêtê û her wiha li medyayên din (wek nimûne, TV, rojname, kovar, malper û kanalên civakî yên medyayên giştî) werin bikaranîn.**

Ez dikarim her demeke hebe, vê razîmendiya xwe bi giştî yan beşekî ji wê betal bikim. Ev betalkirina bikaranînê ji bo siberojê misogir e. Ev betalkirina bikaranînê heta çapa nû ji wan medyayên dîcîtal û çapî, ku hatine dirustkirin, nagire.

Divê mirov daxwaza betalkirina bikaranînê ji vî cihî re bişîne: *Stiftung Lesen, Römerwall 40, 55131 Mainz.*

Ez pê dizanim, ku daxwiyaniya razîmendiyê xwebexş e û tu ziyar nagihin min, heger min qebûl nekir. Min ew agahdariyên bi vê razîmendiyê re fahmkirin û ez pê dizanim, ji bo çî armancan ew wêne û filmên şexsî wê werin bikaranîn.

Cih + Dema kişandina wêne/filman, îmze

heger ew kes qasir be yan heger serweriya wê/wî ya qanûnî hebe Îmzeya serwerê xwedîkirina wê/wî yan ya serperîştê wê/wî



## Agahdarî li ser belavkirina pêzanînen şexsî, wêne û filman li înternêtê

Hêvî ye, ku hun bizanibin, ku di rêya bikaranîna çaverê ya li ser malperên înternêtê û di torên civakî de, **ku derfet ji bo xelkê ji seranserî cihanê heye, ku bikaribin wan wêneyan yan wan pêzanînen belavkirî bibînin û bixwînin.** Dibe ku mirov ji hindek Welatên, ku standardên parastina pêzanînan li wan nîn in yan kêma in jî, bikarbin wan wêneyan bibînin û pêzanînan bixwînin. Saziya "Lesen" ne dikare rê li ber bikaranîna wan pêzanînan li înternêtê bigire û ne jî tu bandorê li ser bikaranîna wan bike, û ji ber vî hawî ew nikare sozê ji bo rêzlêgirtina parastina pêzanînan bike.

Mirov dikare bi bernamêyên lêgerînê pêzanînen şexsî li înternêtê peyda bike û wan kesên di wêneyan de diyarkirî, nas bike. Anku bi vî hawî derfet heye, ku di rêya komkirina van datayan û agahiyên li gel wan datayên di ku li înternêtê li ber dest in, dosyên taybet ji bo wan kesan dirust bikin û derfetên zêdetir ji bo bikaranîne, wek nimûne ji bo armanca reklaman, biafirînin. Ji ber hebûna derfeta dîtin û tomarkirina van datayan ji aliyê cih û kesê din ve li seranserî cihanê, ne dûr e, ku di ser betalkirina razîmendiyê re û di ser jêbirina data û wêneyên te re ji ser malpera me, ku dîsa jî bikaranîna wan ji aliyê kes û cihên din ve yan dîtina wan data û wêneyan di arşîva wan bernamêyên lêgerînê de mumkin be.

## Erkên agahdariyê yê din li gorî madeya 13 ji qanûna bingehîn ya parastina datayan ya europayî (EU-DS-GVO (EU-Datenschutz-Grundverordnung))

Armanca van agahdariyên li ser parastina datayan ew e, ku te agahdar bikin, ka saziya "Lesen" (li xwarê wek "em" yan "me" hatiye binavkirin) wê van datayên te yê taybet ji bo çî bikarbîne. Datayên taybet hemî pêzanînen bi şexsê te ve girêdayî ne. Armanca ji van agahdariyên li xwarê ew e, ku alîkariya te bikin, taku tu mijara bikaranîna datayên xwe yê şexsî tê bighîjî û taku her tişt ji bo te zelal û xwiya be.

Ew wêne û filmên hatine kişandin û her wiha paşnav û pêşnavên kesên wêneyên wan hatine kişandin, wê ji bo wan alavên medyayê ku di razîmendiyê de hatine binavkirin, di çarçoveya dirustkirina raportan li ser roja cihanî ya pirtûkê û her wiha ji bo karê çapameniyê yê saziya "Lesen" û hevpişkên wê yê projeyê (li vê derê: Börsenverein des Deutschen Buchhandels, Deutsche Post DHL Group, Weşanxaneya cbj, ZDF) werin bikaranîn.

Bingeha qanûnî ji bo bikaranîna datayên te yê şexsî ji bo van armancên li jor binavkirî ev razîmendî ye. Ev dayîna razîmendiya te ji aliyê te ve bi şeweyekî xwebexş û azad pêk tê. Ev tê wê wateyê, ku tu ne mecbûr î datayên xwe yê şexsî bidî. Heger hat û te nexwest razîmendiya xwe bidî, em dixwazin bi zelalî û vekirî ji te re bêjin, ku tu ziyar ji ber vê biriyara te nagihîjin te.

Tu biriyarên ji ber xwe nayên encamdan, ku li ser bingeha bikaranîna automatîk hatibin avakirin, û ne jî dirustkirina dosyên taybet tê kirin, û ev kar ne jî ji aliyê qanûnî ve rewa dibe û tu bandora nerênî jî li te nayê kirin.

Ew wêne û filmên hatine kişandin tene hilgirtin heta ku sudeke rewa ya saziya "Lesen" di bikaranîna wan de hebe yan heta ku kesê elaqedar bikaranîna wan betal bike. Ev betalkirina bikaranîne ji bo siberojê misogir e. Ev betalkirina bikaranîne heta çapa nû ji wan medyayên dîcîtal û çapî, ku hatine dirustkirin, nagire.



Her wekî din jêbirin tê encamdan, heger şertek ji şertên madeya 17an bendê 1 ji qanûna bingehîn ya parastina datayan (DSGVO) li ber dest be û heger tu erkên tomarkirinê yên qanûnî ne li dijî vê pêngavê bin.

Li gorî qanûna bingehîn ya parastina datayan ya europayî (EU-Datenschutz-Grundverordnung) tu dikarî daxwaziya van mafan ji me bikî:

- Mafê dayîn agahdariyan
- Mafê serrastkirinê
- Mafê sînardarkirina bikaranînê
- Mafê jêbirinê / mafê jibîrçûnê  
Mafê veguhestina pêzanînan

Her wekî din jî te maf heye, ku tu razîmendiya xwe betal bikî. Di rêya betalkirinê de tiştek ji rewabûna bikaranîna datayan, ji ber hebûna razmendiya te heta dema betalkirinê, nayê guhertin.

Taku tu bikaribî daxwaza yekî ji wan mafên xwe yên li jor binavkirî bikî, tu dikarî her demeke tu bixwazî, peywendiyê bi me re dirust bikî: Andrea Bartl, rêvebirê giştî yê bazirganî, Römerwall 40, 55131 Mainz, bi rêya Ê-Mailê: [andrea.bartl@stiftunglesen.de](mailto:andrea.bartl@stiftunglesen.de).

Heger tu di wê baweriyê de bî, ku em datayên te yên şexsî bi şêweyekî ne rewa bikar tînin, ji kerema xwe peywendiyê bi wekîlê me yê parastina datayan re bike. Navûnîşanên wî ji bo dirustkirina peywendiyên ev in: SPIE GmbH, ji bo birêz Dr. Anton Peuser, Lyoner Straße 9, 60528 Frankfurt am Main.

Te her wekî din jî maf heye, ku tu serî li rêvebiriya çavdêriya parastina datayan jî bidî. Rêvebiriya çavdêriyê ya berpirs ev e: Wekîlê Herêmê ji bo parastina datayan û azadiya agahdariyan yê Herêma Rheinland/Pfalz Rheinland-Pfalz, Postfach 30 40, 55020 Mainz.

